Avêtina ser “ROJ TV” lêdana li azadiyê ye

Cankurd

Friday, March 05, 2010

Dema gelên Musilman li hember televizyon, filmkar û karîkatûrîstên Ewrûpî derdikevin û dibêjin dewlet û deselatdarên wan: ***“Bo çi hûn dihêlin evana dev bavêjin tişt û kesaniyên me yên pîroz?”*** Ewana yekser dibêjin:***”Li Ewrûpa azadiya bîr û baweriyê heye, em nikanin devê kesekî bigirin. Mirov û bangeşînî li ba me azad in…!”***

Rast ev azadî bo giş mirovan li van welatan heye? Ev azadiya ku em gelek bi ser pertavên xwe de kaşkirine, weku panpelîskan li dora çiraxê, lê bi zûkî têne sotandin…?

Bersiva vê yekê paş avêtina polîsên Belcîkî –Turkî ser “ROJ TV” diyar dike, ku ev azadî ne bo giş mirov û saziyên mediya ye…Devên mirovan bi zûkî têne misdan, gava ewana hinek mijaran ji xwe re bikine mijarên rojane…Ji wan jî rexnekirina siyaseta dewlet û deselatdarên Turk di Kurdistanê de.

Turkiye, wekî dewleteke NATO, ku dikane gelek leşker bo va peymana leşkerî herdem û hergav amade bike, ji zû ve li welatên Ewrûpî zor dike, ku bihnê li heme teherên bangeşîniya kurdî teng bikin, rê li wan bigirin, û destûra kar û xebatê di azadiyê de ji wan bistînin…Her dewletek jî li gor têkiliyên xwe yên aborî – siyasî bi Türkiye re dilive û heta pileyekê guh dide deselatdarên Anqere, û axazên wan bi cîh tîne. Belçîka bi va biryara xwe ya ne baş ne tenê wekî piştvanekî zorbaziya nijadperestên Turk xwe dide xuyakirin, belku xwe dike lêderekî ku lêdanên mezin û tund li demokratiyê, azadiyê û mafên mirov û gelan dide…

Ka ew azadiya ku di saya wê de hêrişvanên ser çand û ola Musilman li ku ma? Ew azadiya ku Ewrûpiyan xwe bi wê li ber gelên mayî wekî pêşrew didan diyarkirin li ku ma? Ka ew azadiya ku bi milyonan mirov ji Asiya, Afrîka û ji Latayn û başûrê Amerîka bi ser xwe ve kaş kiriye li ku ma?...

Çi rawestana me li hember kesên di paş ROJ TV de heye, bila hebe, hema lêdana li azadiyê, li demokratiyê û li mafan hîç naye pejirandin… Deselatdariya Belçîkî bi avêtina ser saziya ROJ TV ne tenê xwe dide rex zorbaziya nijadperesta Turkî, ew dikeve sengerê dij azadiyê…

Divê ji me Kurdan re jî, ev bibe derseke taybet ji fêrkirina azadiya peyv û gotinê…

Wekî em ji xelkê azadiyê dixwazin, divê em di nav xwe de jî li wê azadiyê xudan derkevin… Mixabin, ta belavkirina gotarekê di malpereke kurdî de jî pêdiviyê destmaçkirin û tewkirina bo hinekan e… Eve rastiya mediya ya kurdî, rastiyeke tehl û tirş e…û wekî dibêjin: ***“Qirşekî di çavê xelkê de dibîne, lê darekî di yê xwe de nabîne…!”***

Ez bang li heme roşenbîr û siyasetmedar û pêşengên gelê Kurd dikim, ku di vê mijarê de li gel azadiya bangeşînî bin, bêdeng nemînin, û her kesek li gor kanîna xwe piştvaniya azadiyê bike, li hember vê lêdanê derkeve, û li hember heme reşkirin û rêgirtên rêya azadiya bîr û baweriyê be, çi li Ewrûpa û teviya cîhanê û çi li Kurdistanê jî…